Ronahî

Şopdara Kastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar :842 28-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Tûrikê çîvanokan

MEHÊN SALÊ

Ev meh çi ye
Meh Adar e
Dew li dar e

Basimbar e
Nûbihar e

Sibha sar e
Pir xedar e

Berx dibare
Kar diqare

Ya din çi ye

Ew Nîsan e
Dew kîsan e

Kew lîsane
Yê Îsa ne

Şîr adan e
Pel vedane

Jor çiya ne
Tev giya ne

Ya din çi ye

Ew Gulan e
Ya dilan e

Roj bi tîn in
Gul bi bînin

Ya din çi ye

Ew Pûsper e
Dan li cer e

Ya din çi ye

Ew Tîrmeh e
Sî wargeh e

Ya din çi ye

Gelawêj e
Tav dipêje

Ax sincirî
Wek agirî

Ya din çi ye

Ew Rezber e
Tirî zer e

Ya din çi ye

Ew Kewçêr e

Tov li jêr e

Ya din çi ye

Ew Mijdar e
Dinya sar e

Hewa mij e
Digijgij e

Ya din çi ye

Berfanbar e
Berf dibare

Mar li xwar e
Mîna dar e

Ji NASA wêneyê panoramîk yê Marsê

Amûra Perseverance ya Ajansa fezayê ya Emerîka NASA ku li Marsê daniye, wêneyên panoramîk yên zelal şandin. Robota fezayê ya Perseverance li qada ku hefteya borî lê danî 140 wêneyên zelal girtin. Dîmenê panoramîk ya NASA çêkirî, ji van wêneyan çêdibe. Bergeheke çolî bala mirov dikişîne. Wêneyên panoramîk kratera Jezero nîşan dide. Li gorî zanyaran li vê kraterê berî 3,5 milyar salî goleke mezin hebûye ku çemek diçû serê.

Ji zanîngeha Arîzona Jîm Bell got, ''Em li ser sîteyeke pir baş bi cih bûn'' NASA hêvî dike li Gerestêrka Sor du salan 30 eşantiyonê keviran berhev bike ku hêvî dike li ser wan şopa jiyanê bibîne.

Kamerayên Perseverance wê bibin alîkar ku zanyar dîroka jeolojîk ya kraterê û şertên atmosferê diyar bikin û bibin alîkar ku kevirên ku wê bînin cîhanê tespît bike. Tê payîn ev eşantiyon salên 2030'î dema serdaneke Marsê bînin Cîhanê.

NASA roja Duşembê dîmenên dema daketinê bi dengê bayê Marsê re weşandibû.

Bersiva jimara borî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	A	■	A	C	■	Ş	Ê	T	■
2	B	A	W	E	R	Î	■	R	A
3	Î	Z	■	R	■	R	F	■	Q
4	S	A	F	A	R	Î	■	A	A
5	■	D	E	H	■	N	E	V	Î
6	P	■	D	Î	K	■	Y	■	I
7	A	L	Î	■	A	B	■	M	■
8	L	A	■	K	L	Î	N	I	K
9	E	M	R	■	O	■	A	R	Î

Xaçepirs



ÇEP-RAST

1. Dirav... Notayek
2. Baneşana keserê... Kuriya mehînê
3. Têbînî... Cephe, bere
4. Dengê ji tişta dikeve avê derdikeve
5. Celebek kaxiza nivîsê ya stûr û rengê wî weke rengê kayê
6. Notayek... Baneşaneke gazîkirinê... Tûj
7. Tiriyê li per tavê hatî hişkkirin... Nexweşiyek
8. Plakaya navneteweyî ya Iraqê... Ji bo qewirandina heywanên mîna mirîşk û qazan
9. Bi rûsî erê... Rengek

JOR-JÊR

1. Demên rojê... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê... Plakaya navneteweyî ya Îranê
2. (Şîrê …) Şîrê cara yekê yê di pişti zayînê, ku rengê wê zerik e... Temen
3. Beranê 1-2 salî... Dîwarê ji xaliyê hatî çêkirin
4. Dema mirinê... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî
5. Yezdanekî misrî... Demsalek
6. Bi erebî "ez"
7. Beşer, mirov... Pirsek di rewşa ne tewandî de
8. Di argoyê de pereyê yekî jê xwarin
9. Rojek... Daçekek ku wateyê xurt dike... Cihê heranê

Quncika têgînan

Bandor	Te´sîr
Gengaz	Mûhtemel
Girîng	Mûhim
Pankart (Fransî)	Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: Di çalakiyê de parkata "Bimire Dagîrkerî" hat vekirin.
Çalak	Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: *Mirovekî çalak e*
Pêvajo	Ji bo demeke diyar: *Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.*
Pêwendî	Têkilî
Plan (Fransî)	Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.
Proje (Fransî)	Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: Projeya ava bajêr dest pê kir.
Protesto (Îtalî)	Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: *Kurdan Peymana Lozanê protesto kir.*

"Rewşa aborî ya xerab û seqetiyê ez naçarî parsê kirim"

Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo

Piştî derketina şer li Sûrî gelek pirsgirêkên civakî derketin. Digel koçberî, perçebûna malbatan, bihabûn û kêmbûna derfetên kar, xizanî û pars jî bûn parçeyên jiyana rojane. Ev pirsgirêk bûn sedem ku gelek jin berê xwe bidin parsê û destê xwe vekin.

Pars diyardeyeke kevin e, lê di dema niha de zêde bûye. Hina ji xwe re kiriye adet, hina jî ji ber rewşa aborî ya xerab ji xwe re kiriye kar û pîşe. .

"ŞERM E LÊ EZ NEÇAR IM"

Li bajarê Hesekê jina bi navê Hamîda Alewîd ku parsê dike, li ser parsê wiha axivî: "Ji bo peydakirina pêdiviyên malbata xwe, ez navçe navçe digerim. Dizanim karekî şerm e, lê çi bikim. Ji ber rewşa giran ya malbatê pars bû çavkaniya jiyanê. Lawê min miriye û sê zarokên wî sêwî mane. Mafê wan e ku weke her zarokî bijîn. Ez jî ji bo wan parsê dikim. Weke din ti derfetên min nînin."

"EZ KAREKÎ LAYIQ BI NEXWEŞIYA XWE DIXWAZIM"

Jineke din jî ya bi navê Sebah Ehmed ku bi navê Sebûha tê naskirin, li bajarê Qamişlo parsê dike. Sebûha rewşa xwe wiha diyar kir: "Ez û hemserê xwe ji hev qetiyane û dayîka du zarokên nexweş im. Berê di malan de min karê paqijiyê dikir, lê pişti bûyereke trafikê ji lingê xwe seqet bûm. Ji ber wê êdî min nikarî wî karî bikim û min çare di parsê de dît. Ji saziyên taybet dixwazim karekî li gorî rewşa min ji min re peyda bikin."

Çalakiya greva birçîbûnê di roja 94. de dewam dike

...R-2

Şehîdên Çile û Sibatê bi merasimeke biheybet hatin bîranîn

Şêniyên bajarê Dêrikê bi merasimeke biheybet 61 şehîdên li cih û salên cuda meha Çile û Sibatê de şehîd bûyîn, bîr anîn. *R-2*

Ronahî

Şopdara Kastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 842 28-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Dayîkên gerîla: Fedekariya ciwanên me yên li Garê, hêza me xurttir dike

Dayîkên gerîlayên HPGê serkeftina Garê li rêber Abdullah Ocalan, pîroz kirin. Dayîkan serbilindiya xwe bi fedekariya keç û xortên xwe anî ziman ku dewleta tirkî çiyayên başûrê Kurdistanê dike hedef, siyasetmedarên li Bakurê Kurdistanê digire û bi hewldana tinekirina gelê Kurd sûcan li bakur û rojhilatê Sûriyê dike.. *R-3*

LEHENGÊN GARÊ BÛN KABÛSA ERDOGAN

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Mûrat Karayilan diyar kir ku cara yekê ye Erdogan neçar dimîne ku bêje 'Mixabin em bi ser neketin' û got, lehengên me yên li Garê ev axaftin bi Erdogan dan gotin.. *R-5*

Rojnamevan: Astengkirina Ronahî TV li Başûr nayê qebûlkirin

Rojnamevanan diyar kir ku qebûlnekirina Ronahî TV li başûrê Kurdistanê cihê fikaran e û bang li rayedaran kirin ku demildest destûra karkirinê bê dayîn. *R-4*

Li Herêma Cizîrê kirêya xaniyan hat diyarkirin

Meclisa Rêveber ya Herêma Cizîrê bi biryarekê kirêya xaniyan û bendên din yên têkildarî kirê diyar kirin. *R-6*

Çalakiyên Hefteya Çandê bi dawî bûn

Çalakiyên Hefteya Çandî yên MSD'ê bi hevkariya Navenda Çand û Hunerê ya Reqa orgenîz kirî, qediyan. *R-7*

Kongreya Damezrîner ya Meclisên Herêmên Dêrezorê hat lidarxistin

Bi armanca bi rêxistinkirina xebatê meclisên herêma Dêrazorê da ku karibe hê baştir xizmetê pêşkêş bike, Kongreya Damezrîner a Yekemîn a Meclisên Herêmên Dêrazorê hate lidarxistin."R-4

Ji bo şehîdê berxwedana Garê Seydo Refîq merasimek hat lidarxistin

Meclisa Malbatên Şehîdan ya kantona Efrînê ji bo şehîdê berxwedana Garê Seydo Refîq (Hogir Neasan) merasimek li dar xist. *R-5*

Çalakiya greva birçîbûnê di roja 94. de dewam dike

Çalakiya greva birçîbûnê ku li dijî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan li girtîgehan hatibû destpêkirin bi koma 19. berdewam dike.

Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan û binpêkirina mafên li girtîgehan ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li girtîgehên Tirkiyeyê û herêmê hatibû destpêkirin didome. Çalakiya ku bêdem û dorveger hatibû destpêkirin bi koma 19. di roja 94. de didome.

Ji bo çalakiya grevê meş û bang

Li Qosera Mêrdînê komeke ji ciwanan pêk dihat li dijî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan û ji bo ku balê bikişînin ser çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan meş li dar xist. Herwiha li Amedê jî di bin banê Platforma Demokrasiyê ya Herêmê de 344 rêxistinên saziyên sivîl daxuyaniyeke hevpar dan û banga bidawîkirina tecrîdê kirin.

Jinên Dêrezorê li dijî dagîrekriya tirkî meşiyan

Jinên gundên rojhilatê Dêrezorê bi meşekê sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li dijî herêmê şermezar kirin û piştgiriya xwe ji QSD'ê re nîşan dan.
Meşa ku endamên sazî û meclisên gundewarê rojhilatê Dêrezorê tevlî bûbûn, ji pêşiya Navenda Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê ber bi nexweşxaneya Giştî ya Hecînê ve dest pê kir. Di meşê de pankartên şeremzarkirina dewleta tirkî hatin vekirin.
Meş li ber Nexweşxaneya Giştî ya Hecîn rawestiya û deqeyeke rêz hat girtin. Ji rêveberên Meclisa Jinan ya Dêrezorê Fatima El-Salim axivî û got, ji bo şermezarkirina dagîrkeriya tvirkî me ev meş li dar xistiye. Em gel yek in û dagîrkeriya tirkî ya li ser xaka xwe red dikin û banga rizgarkirina herêmên dagîrkirî dikin."
Seroka Yekîtiya Jinên Ciwan ya Dêrezorê Hala El-Mihemed piştgiriya xwe ji QSD'ê re nîşan da û got, meşa me ji bo piştgiriya şervanên QSD'ê yên li eniyan e, em ji wan re dibêjin ku li hemberî dagîrkeriya tirkî em bi we re ne."
Hala El-Mihemed, bang li ciwanên li derveyî welat kir ku li welatê xwe vegerin û tev li QSD'ê bibin.
Ji endamên Yekîtiya Jinên Ciwan şaxê Hecînê Necwa El-Elî jî wiha axivî: "Me ciwanên Hecîn û Dêrezorê ev meş li dar xist da ku piştgiriyê bibin QSD'ê li hemberî dagîrkeriya tirkî. Bi yek dengî em dibêjin, bimire Erdogan, bijî rêber Ocalan."
Meş bi durişmên şermezarkirina dagîrkeriya tirkî bi dawî bû.

ANHA

Li Efrîna dagîrkirî 3 welatî hatin revandin

Çavkaniyan ji hundirê Efrînê ragihand ku li navçeya Mabata û Reco yên girêdayî Efrînê, ji aliyê istixbarata dewleta tirkî ve 3 welatî hatine revandin.

Çavkaniyan da zanîn ku istixbarata dewleta tirkî her sê welatî ji gundewarê navçeya Mabata û Reco yên Efrîna dagîrkirî, revandine.
Li gorî çavkaniyan welatiyên hatîn revandin Aslan Ehmed Emîn û Aslan Behrî Emîn in ji gundê Amara yê girêdayî navçeya Mabata ne.
Dema her du welatî ji Efrînê ber bi gundê xwe ve vedigeriyan li ser riya gundê Kokan yê bakurê navçeyê hatine revandin û çarenûsa wan ne diyar e.
Çavkaniyan herwiha da xuyakirin ku welatiyê din jî yê bi navê Hemîd Qedro Mihemed ji şêniyên gundê Mosaka yê rojavayê navçeya Reco ye û çarenûsa wî jî ne diyar e.
Li gundewar û navenda kantona Efrîna dagîrkirî, revandin, talankirin, dizî, şewitandina darên zeytûnan ji aliyê artêşa tirkî û çeteyên wê ve bênavber tên kirin.

ANHA

Di êrişên hewayî yên li çolistana Sûriyê de nêzî 20 çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin

Balafirên şer yên Rûsya 112 caran nûqteyên çeteyên DAIŞ'ê yên li çolistana Sûriyê xistin.
Li gorî agahiyên Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê bi dest xistîn, balafirên şer yên Rûsya roja Pêncşemê 112 caran nuqteyên DAIŞ'ê yên li çolistana Sûriyê xistn.
Di encamê de nêzî 20 çetî hatin kuştin.
Berî vê êrişê li sêgoşeya Heleb-Hema-Reqa di encama êrişên çeteyên DAIŞ`ê de 9 endamên hêzên hikumeta Şamê hatibûn kuştin û têkiliya bi komekê re ku ji 12 leşkeran pêk dihat qut bû.
Herwiha hat diyarkirin ku li çolistana rojahilatê Hemayê û çola Dêrezorê 10 çeteyên DAIŞê jî hatine kuştin.
ANHA

Çeteyan komkujiya kirîn qeyd kirin!

Kêliyên ku çeteyan li navçeya Şêrawa ya Efrînê bombeya ji dûr ve kontrolkirî teqandin, ji hêla çeteyan ve hat qeydkirin. 2 sîvîl bi vê hovîtiya çeteyan hatin kuştin. Bombeya ji dûr ve kontrolkirî ya çeteyên dewleta tirkî bi cih kirîn, roja Çarşemê li gundê Basûta yê navçeya Şêrawa ya Efrînê hat teqandin.
Çeteyên teqîna bombeyê qeyd kirîn, dîmen li ser medyaya civakî par ve kirin. Di vê hovîtiya çeteyên dewleta tirkî de welatiya bi navê Heyfa Şerîf (21) û Newzat Ekrem Tûbal (45) jiyana xwe ji des dan.

Çeteyên kirêkirî yên Tirkiyê her her roj komkujiyekê li herêmê dikin. Dewletên Ewropî jî dibînin ku pereyên ji bo koçberan dayîn dewleta tirî dide çeteyan û tenê temaşe dikin.

Li El-Şehîl kesên nenas ciwanek kuştin

Kesên ne nas roja Çarşemê ciwanê bi navê Ewac İbrahîm El-Xezam yê ji şêniyên bajarokê El-Şehîl yê gundewarê rojhilatê Dêrezorê kuştin.
Nûçegihana ANHA ragihand ku 2 kesên ne nas li ser motorsiklêtekê, gule berdane Ewac û di encamê de jiyana xwe ji dest daye.
Şaneyên veşartî yên girêdayî çeteyên DAIŞ'ê di demên dawî de çalak bûne û li dijî sivîlan bi taybetî li dijî jinan bi dehan bûyerên kuştinê kirine.

Ber vê bûyerê jî cenazeyê jineke serjêkirî li bajarokê El-Sebha yê gundewarê rojhilatê Dêrezorê hatibû dîtin.

ANHA

Şehîdên Çile û Sibatê bi merasimeke bihevbet hatin bîranîn

Şêniyên bajarê Dêrikê bi merasimeke bi heybet 61 şehîdên li cih û salên cuda meha Çile û Sibatê de şehîd bûyîn, bîr anîn.
Merasim ji aliyê Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Dêrikê ve li Navenda Dîcle ya Çand û Hunerê hat lidarxistin. Merasîm ji bo bîranîna 61 şehîdên Hêzên Sûriya Demokratîk, YPG, YPJ`ê, Hêzên Erkê Xweparastinê, Hêzên Ewlekariya Hundir, Meclisa Leşkerî ya Suryanî û Hêzên Sootoro, hat lidarxistin.
Bi sedan şêniyên herêma Dêrikê beşdarî merasîmê bûn. Di merasîmê de, Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Dêrikê Mehmûd Ehmed nasnameyên şehîdan xwendin. Piştre li ser berxwedana şehîdan snevizyonek hat pêşandan.
Piştre Hevserokê TEV-DEM`ê Xerîb Hiso axivî û fedekariya gerîlayên HPG`ê ya li Garê pîroz kir û got, wan destanên lehengiyê li dijî artêşa tirkî ya dagîrker nivîsîn.
Hiso got, serkeftina Garê di navbera gelê Tirk û fermandarên dewletê de tevlîhevî çêkir. Çimkî ku wan leşkerên xwe kuştin. Hemleya wan ya faşîst li hembreî hêz û îradeya gerîlayên HPG`ê yên li Garê bi bin ket." Merasima bîranînê bi tilîliyên dayîkan û durişmên silavkirina berxwedana HPG û QSD`ê bi dawî bû.

ANHA

Çalakiyên Hefteya Çandê bi dawî bûn

Çalakiyên Hefteya Çandê yên MSD'ê bi hevkariya Navenda Çand û Hunerê ya Reqa orgenîze kirî, qediyan.

Di dawiya çalakiyên Hefteya Çandê de şahiyek li avayiya Navneda Çand û Hunerê hat lidarxistin. Nûnerên Meclisa Sîvîl ya Reqa, rûspî û şêxên eşîrên herêmê, wêjevan û rewşenbîrên Reqa di şahiyê de amade bûn.
Sînevizyonek li ser çalakiyên Hefteya Çandê, ji pêşangeha wênexêziyê, şano, pêşkêşkirina fîlm, semîner û rûniştinên folklorî hat pêşandan.
Piştre Hevseroka MSD'ê Emîne Omer bixêrhatina mêvanan kir û kêfxweşiya xwe bi vegera çalakiyên çandî li bajarê Reqa ku bi paytexta çandê tê nasîn, anî ziman. Herwiha Emîne Omer li ser rewşa çandî ya Reqaqyê û dema di binê dagîrkeriya DAIŞ'ê de bû axivî.
Nûnerên MSD'ê Emîne Omer, Xelîl Xemîs û Selam Hisên, kesên ku hefteya çandê bi ser xistine, xelat kirin.
Piştre ji bo her yek ji van nivîskaran merasimeke imzekirinê hat çêkirin; Dilşad Murad ji bo pirtûka xwe "Ideolojiya Qirkirina Etnîkî", nivîskar Amir Farso ji bo pirtûka xwe ya şanoyê "Helbestvan û Celad" û nivîskar Celaa

Hemzawî ji bo pirtûka "Ji bo kê". Şahî bi beşdarbûna gelek stiranbêjên gelêrî yên Reqa û pêşkêşkirina helbestan bi dawî bû.
Di Hefteya Çandê de, rêzeçalakiyên çandî weke kurtefîlm, şanoya bi navê siya mêrekî ya Deham El-Setam, şanoya (gulên sor layîqî general in) ya Fîras Remedan, hatin pêşkêşkirin. Herwiha di çalakiyê de bal li ser nivîsgeha Bor Seîd ku kevntirîn nivîsgeh e û nûnertiya çandê di dîroka Reqa de dike, hat kişandin.

ANHA

Pêşengê nivîsa Kirdkî

Mela Ehmedê Xasî yan jî bi navê xwe yê tam Mela Ehmedê Sofî Hesenî, weke nivîskarê berhema yekê ya nivîskî ya bi Kirmanckî tê zanîn. Ev alimê dînî yê Kurdistanê 18´é Sibata 1951'ê wefat kiribû. Berhema wî Mewlîda Nebî'yan jî Mewlîda Kirdkî di heman demê de berhema yekê bi Kirmanckî ya çapkirî ye jî.
Mela Ehemedê Xasî sala 1867 yan jî 1868 (1283 yê hicrî) li gundê Hezan hatiye dinê. Ji ber ku bi eslê xwe ji eşîra Zîktî û ji gundê Xasan ê li ser sînorê Dara Hênê û Licê ye, jê re Mela Ehmedê Xasî tê gotin. Lê ew bi xwe li gundê Hezan çêbûye û miriye. Hezan bi xwe îro yek ji gundên mezin ên Licê ya Amedê ye. Ehmedê Xasî li ber destê bavê xwe xwendiyê û paşê jî weke feqî xwendina xwe dewam kiriye. Wî paşê li Amedê xwendina xwe li Medreseya Mesûdiye temam kir û ji miftiyê Amedê Hecî Îbrahîm Efendî îcazeya xwe girtiye. Wî her wiha xwendina tesewufê kir li ber destê şêxê Neqşibendî Şêx Evdilqadirê Hezanî. Wî îcazeya şêxîtiyê wergirt, lê ti carî şêxîtî nekir. Ew demekê li miftîtiya Diyarbekirê dibe muderis. Li gundê xwe Hezanê dibe muderis. Ew demekê bû miftiyê Licê, lê zêde nekişand, piştî salek û 2 mehan wî ji vê wezîfeyê îstîfa kir.
Wî sala 1892´yan Mewlidê Kirdkî nivîsî û li Amedê li çapxaneya Lîtografyayê sala 1899´an 400 nusxeyên wê çap kirin. Berhem heta îro gelek caran bi tîpên Erebî û Latînî derçûye. Heta weşanên Nûbiharê CD´ya xwendina wê jî tevî kitêbê bi xwendina Roşan Lezgîn çap kir. Wî ji bilî Kirmanckî û Kurmanciyê bi Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanî.
Sala 1909´an Mela Ehmedê Xasî ji Amedê hat sirgûnkirin û şandin Rodosê.
Wî li Amedê, li gundê xwe Hezanê ji vê dinyayê bar kir û çû ber rehm û dilovaniya Xwedê.

OZGUR POLÎTÎKA

Li Tirbespiyê Şevbiwêrkek hat lidarxistin

Helbestvanên gundewarê navçeya Tirbespiyê di şevbiwêrkekê de ku ji aliyê meclisa bajarokê Ebû Firi ve hatiye organîzekirin, derbarê rola hevgirtina şêniyên herêmê û parastina erdê xwe de helbest xwendin.
Şevbiwêrk li hola Kongreya Star ya bajarokê Ebû Firi hat lidarxistin. Hol bi wêne û tabloyên ku mîrateya pêkhateyên herêma Cizîrê nîşan didin, hatibû xemilandin. Di şevbiwêrkê de 6 helbestvanên ji gundewarê Tirbespiyê beşdar bûn. helbestvanan bi helbestên xwe rastiya pêkhateyên herêmê û rola wan ya di parastina erdê xwe de nîşan dan.
Di şevbiwêrkê de helbestvan Meha El-Mûtlaq, Kewser El Qeso, Heyfa El Cerbû, Qûsay El Hebîb, Semîr El Wero û Mecid ElCerbû, beşdar bûn.
Endamên nivîsgeha Meclisa Sûriya Demokratîk şaxê Tirbespiyê, Meclisa bajarokê Helwa û şêniyên bajêr beşdarî şevbiwêrkê bûn.
Endamê meclisa Ebû Firi Rexda El-Celo dest bi vekirina şevbiwêrkê kir û bal kişand ser girîngiya

çandê û rola wê ya berbiçev di pêşveçûna şaristanî û neteweyî ya bi salan.
Rexda wiha berdewam kir: "Dewletên desthilatdar û kaptalîst şerê çandan dikin da ku nasnameya gelên ku bi çand, nasname û dîroka xwe tên naskirin, ji holê rakin. Herwiha Rexda bang li her kesî kir ku ji bo jiyaneke azad û birûmet çand û nasnameya xwe biparêzin.
Piştre helbestvanan derbarê rastiya ku dijîn, zehmetiyên ku kişandine û hevgirtina pêkhateyên herêmê di parastin û berxwedana li hember êrişan de helbest pêşkêş kirin.
Şevbiwêrk bi govendên gelêrî bi dawî bû.

ANHA

Li Mexmûrê Mihrîcana 13. ya 4'ê Nîsanê dest pê kir

Li Wargeha Mexmûrê Mihrîcana 13. ya Çand û Werzişê ya 4'ê Nîsanê dest pê kir. Mihrîcan bi tornûvaya fotbulê hat destpêkirin û wê heta 4'ê Nîsanê bi çalakiyên curbecur berdewam bike. Bi pêmana 4'ê Nîsanê roja jidayîkbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li Wargeha Mexmûrê Mihrîcana 13. ya Çand û Werzişê ya 4'ê Nîsanê dest pê kir. Mihrîcanê wekî hemû salên din bi turnovaya futbolê dest pê kir. Beriya ku mihrîcan were destpêkirin li ser giyanê tevahî şehîdên Garê deqeyek rêz hat girtin û piştre li ser girîngiya mihrîcanê Mamoste Cemîl Kara axivî. Kara di serî de mihrîcana çand û werzişê diyarî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir û wiha got: "Hemû şervanên azadiyê niha li her qadê li beramberê dijminên hov têkoşîn dikin. Em jî vê mihrîcana xwe diyarî wan berxwedêrvanan dikin. Armanca me ya vê mihrîcanê, pîrozkirina 4'ê Nîsanê ye. Bi pêşengiya qada perwerdê emê bi tûrnûvaya fotbûlê dest bi mîhrîcana xwe bikin. Her wiha em silavên xwe ji çalakvanên greva birçîbûnê re dişînin. Emê bi saya van çalakiyan, Rêberê xwe azad bikin. Li her qada ku çalakî lê tê kirin, ew der pîroz e. Heta ku em Rêberê xwe azad nekin, emê dest ji têkoşîna xwe bernedin. Em di wê baweriyê de ne em ê teqez bi serkevin û Rêberê xwe bi fîzîkî azad bikin."
Piştre Mihrîcana 13. ya Çand û Werzişê ya 4'ê Nîsanê bi tûrnûvaya fotbulê dest pê kir. Wê çalakiyên ji bo mihrîcanê heta 4'ê Nîsanê berdewam bikin.

Hebûna Min Girêdayî Hebûna Zimanê Min e

Sîpan Şînda

Hebûna kesan yan ji civakan girêdayî çanda wana ye. Hebûna çandê ji girêdayî zimanê netewî ye. Heger zimanê civakekê, netewekê tune bibe, ew netew jî ji dîrokê tune dibe. Jiber wê hebûna netewan girêdayî hebûna zimanê wana ye. Ji bû netewekê çeka herî xurt ya li himberî dagirkerî û mêtînger iyê zimanê wana ye. Heta ku netewek li zimanê xwe xwedî derbikeve, dagirker û mêtînger her tim şikestîne û li rê û rêbazên serkeftinê digerin. Lê dema netewekê dev ji zimanê xwe berda û ziman û çanda dagirkerên welatê xwe û mêtîngeran êxistin di nava jiyana xwe de û lê xwedî derketin, wê demê bi awayekî politîk çiqasî bi zanabin ji, mixabin êdî ew binketîne û mêtîngerî serketiye, dagirkerî mayînde bûye û gehiştiye armanca xwe. Jiber wê, divê netewa Kurd di vî warî de bi taybetî ji li Bakûrê Kurdistanê û li Ewropayê rûne û ji xwe re li ser vê mijarê hizir bike.
Girêdayî vê mijara ziman, PENa Kurd di heyîva sibatê de du civînên girîng û berfireh li ser zimanê Kurdî pêk anî. Di van herdu civînan de li ser rewşa zimanê Kurdî ya li her çar perçên welêt û diyasporayê hate sekinîn. Gelek nivîskar, zimanzan û helbestvan tevilî van civînan bûn û nêrînên xwe anîn ziman. Ji her çar perçan mêvan tevil bûn û rewşa zimanê Kurdî vegotin. PENa Kurd ji bi boneta 21ê Sibatê roja zimanê zigmakî encamên van civînan kire rapor. Di vê raporê de pirsgirêk û tehlûkeyên li pêşiya zimanê Kurdî derdikevin pêş. Di raporê de bi awayekî eşkere tête diyarkirin ku zimanê Kurdî li Bakûrê Kurdistanê (Kurdmancî/Kurmancî-Zazakî) di bin tehlûkeyek mezin de ye. Pergal li her derî pêşiyê li ber Kurdî digire û zexteke mezin li ser zimanê 25 milyon Kurdî heye. Nebûyîna zimanê perwerdehiyê jî bû Kurdî xetereya mezintirîn e. Jiber vê, divê Kurd li her qadê bi Kurdî baş-nebaş zanin, hindikgelek zanîn ne meseleye, hema kî çiqas bizane bila ewqasî biaxive. Bila tu kes nebêje devokê min ne xweş e, yan ez Kurdî baş nizanim; Kurdiya her Kurdî çi devok be bila bibe, xweş e û meşrû ye. Dîsa di raporê de tête diyarkirin ku teknolojî ji bû pêşvebirina ziman derfetekî girîng e û divê Kurd di vî warî de çalak bibin. Divê çapemenî medya Kurdî bi awayekî hişyar û zanistî li ser ziman bisekine û bernameyên li ser ziman û zarokan zêde bikin. Bi taybetî ji bo zarokan divê fîlmên karton zêde bêne çêkirin/dûblaj kirin û bi rêya înternetê bêne belavkirin. Herweha divê malbat ji bo zarokên xwe çirok, metelok, mamik, zûgotin û hwd bêjin, bixwînin û lîstokên Kurdî nîşanî zarokên xwe bikin. Di vê raporê de gelek tiştên girîng ji bû pêşvebirina zimanê Kurdî hene, yên bixwazin dikarin vê raporê li ser vê girêdankê bixwînin.
https://www.nerinaazad.co/kr/news/life/culture/pesvebirina-zimane-kurdi-raporapena-kurd-2122021-roja-zimane
Belê, îro li ser Kurdan û Kurdî şerê derûnî bi rêya çapemeniyê, medyayê, medya civakî, hemû sazî û dezgehên pergalê ango di hemû qadan de bi awayekî dijwar tête meşandin. Pergal di vî warî da çi exlaqî nas nake û hemû rê û rêbazan ji bo xwe rewa dibîne. Divê Kurd ji li himberî vê hovîtiyê hişyar bibin û xwedî li zimanê xwe derbikevin. Dîsa ez dibêjim hebûna min girêdayî hebûna zimanê min e, gelo ya we girêdayî çi ye?

"Serkeftina Garê, serkeftina Şingalê, bakur û rojhilatê Sûriyê ye"

Bi hezaran şêniyên Dêrikê û navçeyên wê ji malbata şehîd Ebducebar Mihemed (Xabûr Dêrik) re ku di berxwedana Garê de şehîd bûye, sersaxî xwestin.

Bi hezaran şêniyên herêma Dêrikê ya girêdayî Qamişlo, şandeyên ji saziyên sîvîl, leşkerî, Hêzên Ewlekariya Hundir, Hêzên Hawarî, Hêzên Trafîkê, oldar, Meclisa Rûspiyên Eşîran û partiyên siyasî berê xwe dan Navenda Şehîd Bawer ku sersaxiya malbata şehîd Xabûr Dêrik bikin.

Dema welatî gihîştin Navenda Şehîd Bawer ya ku bi wêneyên berxwedana Garê û wêneyên şehîd Xabûr Dêrik, al û sembolên kurdî hatibû xemilandin, durişmên bijî berxwedana garê, şehîd namirin avêtin.

Piştî merasimê ji fermandarên YPG'ê Botan Dêrik axivî û wiha got: "Berxwedana Garê, destaneke dîrokî ya nû li têkoşîna Tevgera Rizgariya Kurdistanî nivîsand û planên bi armanca berdewama Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd û gelên herêmê bi bin xistin."

Dêrik wiha domand: "Serketina Garê serketina Şingal, bakur û rojhilatê Sûriyê û tevahî parçeyên Kurdistanê ye. Divê em li hember planên dewleta tirkî ya faşîst yên bi hedefa têkbirina vîna me, bisekinin."

Endamê rêveber yê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Dêrikê Hesen Ubeyd îşaret bi planên dewleta tirkî ên bi hedefa têkbirina fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan kir, ku êdî rêber Ocalan bûye rêberê gelên azadîhez.

Hevserokê Desteya Hundirî ya herêma Cizîrê Kenan Berekat bi navê Rêveberiya Xweser wiha axivî: "Girtina rêber Abullah Ocalan di encama komployeke navneteweyî de bû û êrîşa li dijî Garê, berdewama vê komployê bû."

Endama rêveber ya Kongreya Star ya Dêrikê Şadya Yûsiv axivî û serkeftina berxwedana Garê ya ku destanên lehengî û fedayiyê li dijî dewleta tirkî şikandiye pîroz kir.

Li aliyekî din jî bi navê oldarên Dêrikê Yûsif Ehmed wiha got: "Şehîd li gel xwedê û mirovan pîroz e. Ji ber ew canê xwe di oxira parastina rûmet, xak, pîrozî û nirxên mirovahiyê de feda dikin."

Bi navê malbata şehîd Xabûr Dêrikê jî, Viyan Hesen wiha axivî: "Dewleta tirkî ya faşist tevahî çereyên çekan bi kar anîn. Lê gerîlayên HPG'ê berxwedaneke dîrokî ya bêhempa raber kir û destaneke dîrokî li ser destanên di dîroka têkoşîna Tevgera Rizgariya Kurdistanê de zêde kir."

Dotmama şehîd, Viyan Hesen da zanîn ku berxwedana Garê destana qehremantiyê nivîsand, da ku nifşên pêşerojê bi azadî û rûmet bijîn.

Wesîqeya Şehadetê;

Nav û Paşnav: Ebducebar Mihemed. Navê tevgerî: Xabûr Dêrik. Navê bav: İsmaîl. Navê dê: Zelîxe. Dîroka tevlêbûnê: 2013'an. Dîroka Şehadetê: 14'ê Sibata 2021'an

ANHA

Zanîngeha Rojava beşdarî pêngava"Biskên Kesk" bû

Xwendekar û mamosteyên Zanîngeha Rojava beşdarî pêngava "Biskên Kesk" ya bi armanca zêdekirina rûberên kesk li bakur û rojhilatê Sûriyê, bûn. Pêngava dilxwazî ya civaka sîvîl ku ji Cotmeha 2020'an ve bi durişma "Biskên Kesk" dest pê kiriye, dewam dike. Pêngav ji bo zêdekirina rûberên kesk û şîntayî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye.

Sedema navlêkirina vê pêngavê bi biskên kesk, vedigere rola jinan ya pêşeng, beşdariya wê di qadên şer de û keda wê ya mezin di parastina xakê de. Herwiha sedema din jî ji ber biskên keçên Êzîdî yên bûyîn qurbanên DAIŞ'ê.

Amadekirina pêngavê li ser 3 qonaxan pêk hat, pêngava yekê çandina tov bû, pêngava duduyan çandina çiqilan bû û pêngava sisiyan jî piştî amadebûna şitilan, belavkirina daran li ser herêman bû. Herwiha komîteya zanistî çavdêriyê li ser xebata vê pêngavê dike.

Wê darên cuda yên mîna tirî, hêjîr, tû, hinar û hwd bên çandin. Tê payîn ku fistiq di merheleya bê ya ji Adarê ve werin çandin û hin darên ku bi tov tên çandin, biçînin.

Çavdêrê li ser insiyatîfê û hemleyê ziwar Şêxo diyar kir ku hemleya "Biskên Kesk" wê bandoreke erênî li herêmê bike û wiha got: "Erêniyên vê hemleyê ji

aliyê aborî ve gelek in. Çimkî wê cureyên zêde ji fêkiyan li herêmê dabîn bike û dê bedewbûnekê li herêmê çêke û bibe piştgiriya başbûna jînegeh û hawayê."

Şêxo diyar kir ku hemle heta çandina 4 milyon şitilî wê derbasdar e.

7- Peymanên ku beriya derxistina vê biryarê pêk hatine, heta bidawîbûna dema xwe wekî xwe dimînin. Piştre bi erêkirina her du aliyan û piştî ku bendên li dijî vê biryarê tên rastkirin eqd tê nûkirin.

8- Yên bendên vê biryarê pêk neynin, miqdareke pere bi qasî du qat pereyên kirêyê wekî ceza lê tê birîn. Heke muxalefe dubare bibe, ev miqdar du qat dibe û eqdê wê kesî betal dibe.

ANHA

Li Herêma Cizîrê kirêya xaniyan hat diyarkirin

Meclisa Rêveber ya Herêma Cizîrê bi biryarekê kirêya xaniyan û bendên din yên têkildarî kirê diyar kirin.

Rêveberiya Xweser ya herêma Cizîrê li ser malpera xwe ya fermi ev agahî dan: "Li ser bingehê berjewendiya giştî û ji bo rêgirtina li bihabûna kirêya xaniyan, ev biyar hatin girtin:

1-Kirêya xaniyan li gorî van beşên li jêrê diyar dibe:

Beşa 1: Kirêya xaniyên normal di navbera 10 û 50 hezar lîreyên Sûriyê de ye.

Beşa 2: Kirêya xaniyên navî di navbera 50 û 75 hezar lîreyên Sûriyê de ye.

Beşê 3: Kirêya xaniyên baş di navbera 75 û 100 hezar lîreyên Sûriyê de ye.

Beşa 4: Kirêya xaniyên sûper dîloks di navbera 100 û 150 hezar lîreyên Sûriyê de ye.

2- Di belgekirinê de peymana kirêkirinê ya ji aliyê Yekîtiya Esnafan ve hatiye derxistin, esas e.

3- Piştî erêkirina komînê û Nivîsgeha Karûbarê Avayîsaziyê ya Ewlekariya Hundir, peyman li gel şaredariya têkildar tê belgekirin.

4- Hevserokên her komînekê û endamên rêveberiya komînê belgeyeke taybet bi xaniyên li erdnîgariya komînê hatine kirêkirin, li cem xwe dihêle.

5- Divê hevserokatiya komînê û endamên rêveberiya komînê, çalakiya kirêkirinê yên avahiyên di erdnîgariya komînê de bişopînin û li dijî muxalefetan tedbîrên pêwîst bigirin.

6- Di rewşên betalkirina peymana kirêkirinê, bidawîbûna wê, dabînkirin û lêçûna restorekirin û di rewşên din de, bendên qanûna sîvîl li ser eqdê kirêkirinê

derbasdar e.

Dosta Kurdan di siyaseta Beljîka de: Nelly Maes

Derwêş M. FERHO

De 'Rooie Nel', Nela Sor dihat bi navkirin. Keça gundî, wêrek, berxwedêr û bê tirs. Dost û hevalbenda gelên bindest. Şoreşgera engê sor, di nava hêzên parêzgerên mafên merov û gelan de hezkirî. Ji bo gelek kesan Jodie Fostera Flaman 80 saliya xwe qedand.

Dema me di 1978 de Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka 'Têkoşerava kir, bi parlementerê wê demê Willy Kuijpers re têkiliya me bi Nelly Maes re pêk hat. Wê pê re pê re behsa Dr. Ismet Cherif Wanly kir. Dr. I. Cherif ji bo kongreya xortan hatibû vexwendin û hem li mala Willy Kuijpers, hem li mala Nelly Maes bûbû mêhvan. Her duyan jî behsa cixarekêşiya Dr. I. Cherif dikir. "Cixare li pey cixarê, oda rûniştin û ya razanê tim tijî duman bû".

Nelly Maes di temamiya jiyan xwe ya siyasî de ji bo aştiyê, jiyanek pêkhev, pirrdeng û konfederalîzmê têkoşîn kiriye. Li saziyên ku kar dikir mijara demokrasiyê û bi taybetî mafên jinan ciyê sereke digirt. Bi nasîna rêzdar Maurits Coppieters ew li ser lîsta VU (1970) dikeve bijartinan û dikeve meclîsa bajarê xwe Sint Niklaas. Di heman demê de jî seroka rêxistina VUJO (Ciwanên Volksunie) bû. Ji wê demê ve jî di nava partî û yekîtiya ciwanan de xeta çep-gelparêz xurt dibe. Di bijartinên 1977 de serketî dikeve nava parlemento de.

Di 1998 de diçe parlementoya Ewropa û li wira jî xebata xwe ya darîçav dike. Mafên merovan, mafên gelên bê dewlet: Kurd, Katalan, Bask, Asûrî, … Ji 2004 het 2009 serokatiya Hevgirtina Azad ya Ewropa dike ku bi balkêşî li ser gel û herêmên cuda lê bê dewlet in xebata xwe didome. Demek dirêj jî di nava xebata Weqfa CMC de (Centrum Maurits Coppieters) aktîf ma. Wek tê zanîn CMC ji roja avakirina xwe heta îro di pirsgirêka Kurdî de xwedî ciyekî bi rûmet e.

Di 2005 de Enstituya Kurdî ya Brukselê xwest cî û rola jinê di nava civaka Kurdî de, di têkoşîna azadiyê de bide naskirin. Ji Weqfa Jinên Azad ya Navneteweyî rêzdar Nursel Kiliç, ji du saziyên li welêt, Yeter Akin û Seren Dalkiran, ji Berlîn jî Dr. Mukaddes Şahin beşdar bûbûn. Di nava inîsiyatîfa vê konferansê de bê goman Nelly Maes jî tev Martien Bode hebûn û Lieve Driesen hebûn. Konferansa di roja 16.12.2005 de li Brukselê pêk hat bi giranî li ser rol û kesayetiya jinê di nava civak û têkoşîna azadiya Kurdî de pêk hat. Enstituya Kurdî ya Brukselê amadekar, Federasyona Jinên Flaman alîkar bûn.

Nelly Maes, di xaftina xwe de li cem pirsgirêk, zor û nehqiyên li ser jinê, di civakê de, li ser dilnexwaziya mêran jî rawestа. Kêfxweşiya xwe ji bo beşdariya jinên Kurd di konferansê de got û serketin ji wan re hêvî kir.

Nelly Maes bang li hemû hêzên Flaman û Ewropî kir. "Ji têkoşîna azadiyê re li Kurdistan, bi jina Kurd re hevkar bin. Serketina wê têkoşînê ne bes ji Kurdan re, lê ji me re jî serbilindiye. Eger em ji wê têkoşînê re nebin hevkar, ewê pêşeroja me de weke kêmasiyek, weke birînek kûr were nivîsandin. Ez, ne bes weke jin lê weke siyesetmedar jî bi hemû hebûna xwe bi têkoşîna jina Kurd re, bi gelê Kurdistan re piştgir im. Bijî têkoşîna azadiya Kurdistan."

Dayîkên gerîla: Fedekariya ciwanên me yên li Garê, hêza me xurttir dike

Dayîkên gerîlayên HPGê serkeftina Garê li rêber Abdullah Ocalan, pîroz kirin. Dayîkan serbilindiya xwe bi fedekariya keç û xortên xwe anî ziman ku dewleta tirkî çiyayên başûrê Kurdistanê dike hedef, siyasetmedarên li bakurê Kurdistanê digire û bi hewldana tinekirina gelê Kurd sûcan li bakur û rojhilatê Sûriyê dike.

Artêşa tirkî ya dagirker di 10'ê Sibatê de bi çekên pêşketî êrişî herêma Garê ya başûrê Kurdistanê kir. Piştî berxwedana 4 rojan gerîla êrişên wan têk birin û serkeftina berxwedana xwe ya li hember hovîteya dewleta tirkî ragihandin. Welatiyan êrişa li dijî herêma Garê şermezar kir, herwiha kêfxweşiya xwe ya ji bo serkeftina gerîla li dijî dagirkeriya tirkî anî ziman. Girêdayî mijarê dayîkên gerîlayên Hêzên Parastina Gel (HPG) ji ANHA re axivîn.

Xirme Elî Xelef dayîka gerîla Hêvîdar Tirbespiyê, ku di 2013'an de tev li refên gerîla bûye, serkeftina HPG'ê li çiyayên Gerê ya li hemberî dewleta tirkî ya faşist li rêber Abdullah Ocalan pîroz kir. Xirme Elî Xelef axaftina xwe wiha domand: "Zarokên me ji bo jiyaneke azad, riya şehadet, azadî û parastina Kurdistanê, ji xwe re bingeh girtin."

"EM BI BERXWEDANA KEÇ Û XORTÊN XWE SERBILIND IN"

Dayîka gerîla Hêvîdar diyar kir ku berxwedana keça wê hêza wê bilind dike û wiha got: "Ji bo ku gelê Kurd û gelên herêmê azad bijîn, keçên me her tim amade ne ku li tevahî parçeyên Kurdistanê, şer bikin."

Ji aliyê din Mûntehe Xelîl Ebdullah dayîka gerîla Arîn ku di 2012'an de tev li gerîla bûye wiha got: "Arîn fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan ji bo riya berxwedanê ji xwe re kir bingeh."

Mûntehe Xelîl Ebdullah da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker di êrişên xwe yên li dijî herêmên Parastinê yên Medyayê de, bin ket.

Mûntehe Xelîl Ebdullah axaftina xwe wiha domand: "Şkestina berxwedana Gerê xewna Erdogan bû, lê her êrişek berxwedana gerîla xurt dike ku hêza xwe ji fedekarî û xwîna şehîdan digirin."

Mûntehe Xelîl Ebdullah bal kişand ser siyaseta dewleta tirkî ya bi armanca qirkirina gelê Kurd û wiha pê de çû: "Dewleta tirkî çiyayên başûrê Kurdistanê dike hedef, siyasetmedarên li Bakur digire, herwiha bi armanca qirkirina gelê Kurd sûcan li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike."

MÛntehe Xelîl Ebdullah di dawiyê de da xuyakirin ku wê şopdara riya keça xwe be û heta bidestxistina azadiyê, wê tê bikoşe.

ANHA

"Em sala 2021'ê bikin sala azadiya jinan"

Li kantona Qamişlo bi pêmana 8'ê Adarê Roja Jinan ya Cîhanê, semîner hatin dayîn. Hat gotin felsefeya azadiya jinan ya rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kirî, hêzeke mezin da jinan da ku ji bo azadiya xwe têbikoşin.

Di çarçoveya çalakiyên 8'ê Adarê Roja Jinan ya Cîhanê de ku bi durişma "Têkoşîna me misogeriya şoreşa jinan e" li bakur û rojhilatê Sûriyê tên lidarxistin, Kongreya Star ya kantona Qamişlo semîner li bajarokê Girbawî, navçeya Til Hemîs û Amûdê dan. Semîner bi amadebûna bi dehan jin hat dayîn. Hola semîneran bi wêneyên şehîdan, alên Kongreya Star û pankartên durişmên çalakiyan hatibû xemilandin.

Semînera li bajarokê Girbawî ya kantona Qamişlo ji aliyê endama rêveber ya Kongreya Star Hala Faris ve hat dayîn. Hala roja 8'ê Adarê da nasîn û diyar kir ku 8'ê Adara 1857'an bi hezaran jin daketin meydana New York û doza mafên xwe, pêkanîna wekheviya jin û mêr û rakirina neheqiyê ji wan kirin. Bi wê re ev roj bû rojek ku jinên cîhanê rabûn . "

Hala Faris Roja Jinan ya Cîhanê li tevahî jinan pîroz kir û şehîd Hind û Seida bi bîr anîn û got, sala 2021'an wê bibe sala azadiya jinan.

Semînera li avahiya Komîteya Rêveberiya Dibistanan ya navçeya Til Hemîsê ji aliyê endama Dîwana Edaleta Civakî ya Til Hemîsê Gulşîn Îbrahîm û endama Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya Herêma Cizîrê Hemdiya Ehmed ve hat dayîn.

Di semînerê de behsa dîroka Roja Jinan ya Cîhanê hat kirin û şoreşa jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Hemdiya Ehmed wiha got: "Îdeolojiya azadiya jinan ya rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kirî hêzeke mezin da têkoşîna tevahî jinên Rojhilata Navî û cîhanê û rê li pêşiya wan vekir.

Li navçeya Amûdê jî semînerek li hola civînana ya Meclisa Qanûnsaz a Rêveberiya Xweser ya Herêma Cizîrê hat dayîn. Endama rêveber ya Meclisa Edaleta Jinan Henîfa Mihemed semîner bi rê ve bir.

Henîfa Mihemed têkoşerên ku ji bo jiyaneke azad û wekhev canê xwe dan bîr anîn û li ser dîroka Roja Jinan ya Cîhanê û rola kapîtalîzmê û bandora wê li têkoşîna jinan wiha got: "Kapîtalîzm hewl dide siyaseta nirxên civakê yên cewherî têk bibe, dixwaze 8'ê Adarê ji cewherê wê derxîne, lê di vê rojê de hemû jinên cîhanê bi israreke ku ji berê bihêztir dadikevin qada û rengê jina berxwedêr û têkoşer û kedkar îfade dikin."

Semîner bi durişmên banga azadiya jinan bi dawî bû.

ANHA

Jinên Dêrezorê bernameya 8`ê Adarê eşkere kirin

Bi pêmana Roja Jinan ya Cîhanê Komîteya Jinan ya Meclisa Sîvîl ya Dêrezorê komek çalakiyên bi hevkariya Meclisa Jinan û Malbatên Şehîdan ya Dêrezorê organîze kirîn eşkere kirin.

Endama rêveber ya Komîteya Perwerdeyê ya Dêrezorê Fatme Mihemed bi navê jinên Dêrezorê bernameya çalakiyên ji bo 8'ê Adarê bi daxuyaniyekê eşkere kirin. Daxuyanî li pêşiya Kelha Helebiyê û Zelebiyê ya gundewarê rojavayê Dêrezorê hat xwendin.

Hemle bi durişma"Bi ruhê Hindê û Seida emê pêvajoya 8`ê Adarê bidomînin" dest pê dike û di bernameyê de semînr, panelên pênaseya Roja Jinan ya Cîhanê, têkoşîna jinan di dîrokê de digel desthilatiya hikumetên destpot û zihniyeta mêrdestiyê û heta piştî rizgarkirinê hene.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku Hindê û Seida wê her tim ji bo jinan tîrêjên ronahiyê, çavkaniya hêzê û ilhamê bin û wiha hat gotin: "Îro em di şoreşeke rastî de ne ku ew jî şoreşa jinan e. Projeya neteweya demokratîk û Rêveberiya Xweser piştgirî dan jinan ku maf û azadiya xwe bi dest bixin, di heman demê de felsefeya neteweya demokratîk xwe dispêre jinan.

Di dawiya daxuyaniyê de hat diyarkirin ku kuştin û tundiya ku jin pê re rûbirû dimînin, pirên ronahî, azadî û rûmetê ne da ku paşrojeke azad bi bi dest bixin, bi ruhê Henaa El-Seqir wan dest pê kir û bi ruhê Hevrîn Xelef li ber xwe dan û wê bi ruhê Hindê û Seida dewam bikin.

ANHA

Jinan komxebatek li dar xist

Meclisa Jinan ya PYDê ji bo xurtkirina rola jinan di warê siyasî de, komxebatek organîze kir.

Komxebat roja Çarşemê li hola civînan ya li navenda giştî ya PYD`ê li bajarê Qamişlo bi amadebûna endamên partiyên siyasî yên herêma Cizîrê, Mala Êzîdiyan ya Herêma Cizîrê, Kongreya Star hat lidarxistin.

Mijarên komxebatê ji aliyê endama Meclisa Jinan ya PYD`ê Sema Bekdaş û hevseroka Desteya Darayî ya Herêma Cizîrê Welîda Hesen ve hatin pêşkêşkirin.

Axaftvanan diyar kir ku xala yekê ew e ku jinên ku cihê xwe di navê partiyên siyasî de digirin, bên aktîfkirin. Herwiha pêşxistina jinan di milê siyasî de û nîqaşkirina li ser zagonên navneteweyî ku jinan di paşrojê de biparêze.

Mijara yekê ji aliyê Welîda Hesen ve hat şîrovekirin ku xala yekê li ser hêza jinan ya li ser pêkanîna kontrolkirina cihekî û birêvebirina wê û da zanîn ku ev yek pêşî li cem tevgerên nîştimanî yê ku bangа mafên sivîl û bingehîn dikirin, derket holê.

'DIVÊ ARMANCA ME GUHERTINA ZAGONAN BE'

Welîda got, eger rola jinan di warê aborî û siyasî de pêş bikeve wê pêşketinê di warê civakî de jî biafirîne. Herwiha wê rê li ber pirsgirêkên civakî jî bê girtin. Welîda diyar kir ku cudahiya di navbera aktîfkirina jinan û pêşxistina wan di warê siyasî de ew e ku pêşxistin tê bi wateya girêdana bi mijarekî tenê ve, lê di aktîfkirina jinan de tê wateya ku aktîfkirina wê di gelek waran de wekî siyasî, civakî û aborî.

Piştre nîqaş li ser têgîna aktîfkirina jinan di warê siyasî de hat kirin. Di nîqaşan de hat diyarkirin ku divê kêmasiyên heyî di pêşerojê de li cem jinên siyasetmedar bên derbaskirin.

Piştî nîqaşan li ser danezana mafên mirovan ya navneteweyî sînevizyonek hat pêşkêşkirin û ji aliyê Welîda Hesen ve hat şîrovekirin.

ANHA

Rojnamevan: Astengkirina Ronahî TV li Başûr nayê qebûlkirin

Rojnamevanan diyar kir ku qebûlnekirina Ronahî TV li başûrê Kurdistanê cihê fikaran e û bang li rayedaran kirin ku demildest destûra karkirinê bê dayîn.

Nûçegihanê Dengê Emerîka Zana Umer û endamê rêveberiya VON Radyoyê Xoşman Qado diyar kirin ku qebûlnekirina karkirina Ronahî TV ji aliyê hikumeta başûrê Kurdistanê ve, cihê fikaran e û gotin divê ev pirsgirêk demildest bê çareserkirin.

Nûçegihanê Dengê Emerîka yê Rojava Zana Umer vekirina nivîsgeha Ronahî TV li başûrê Kurdistanê weke "pêdiviyekê" bi nav kir û got, bi çavên Ronahî TV em dixwazin başûrê Kurdistanê nas bikin û bişopînin.

Zana Umer xwest xebata çapemeniya azad neyê astengkirin û got, bi serbestî karkirina Ronahî TV li başûrê Kurdistanê wê xebata çapemeniyê ya li herêmê jî dewlemendtir bike.

'RONAHÎ TV DIKARE BIBE PIRA DI NAVBERA ROJAVA Û BAŞÛR DE'

Umer diyar kir ku dema DAIŞ'ê êriş kir, Ronahî TV xwediya misyoneke dîrokî bû ku rastiya li herêmê derxist holê û belav kir û got, di êrişên dawî yên dagîrkeriyê yên li ser Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê de û dema DAIŞ'ê êrişî gelek deveran kirî, 25 rojnamevan hatin kuştin. Bi birîndar bûn. Ronahî TV bi ked û hewldaneke mezin heta roja îro hat. Ji bo me girîng e em logoya Ronahî TV li herêma başûrê Kurdistanê bibînin û em ji vê bi hêvî ne. Em dixwazin bi nûçe û bernameyên ku Ronahî TV çêke û ji perspektîfên cuda başûrê Kurdistan nas bikin û lê temaşe bikin."

Endamê rêveberiya VON Radyoyê û rojnamevan Xoşman Qado jî ev nirxandin kir: "Divê ji bo hemû dezgehên çapemeniyê yên li derxistina meclisên Dêrezorê di dîroka Rêveberiya Xweser de gaveke girîng e û wê hêzên leşkerî yên herêmê ji bo xizmeta welatiyan û parastina saziyan bi hev re bixebitin.

El-Xebîl diyar kir ku avakirina 4 meclisan li Dêrezorê tê wateya pişтgiriya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê.

Bi navê Meclisa Qanûnsaz Ziyab El-Cîlat jî got, serkeftinên li Dêrezorê berhemên keda şehîdan in. Ji ber wê divê em di Rêveberiya Xweser de hemû welatan destûrnameyên kar bên dayîn. Divê teqez xebatên weşangeran neyên astengkirin. Nehiştina ku Ronahî TV li herêma başûrê Kurdistanê ofîsên xwe veke, ji bo azadiya çapemeniyê fikar e."

Xoşman Qado xwest hikumeta Başûrê Kurdistanê êdî çapemeniya azad neke hedef û wiha got: "Ronahî TV jî wekî hemû rêxistinên ku li wir kar dikin, mafê wan heye ku li Başûr ofîsên xwe veke, ji ber ku belgeyên xwe yên pêwîst ên qanûnî pêşkêşî aliyên peywendîdar kirine. Eger pirsgirêkek hebe, kêmasiyek hebe, bi ya min divê hikumeta Herêma Kurdistanê ji rêveberiya Ronahî TV re ragihîne."

ANHA

Siyasetmedar: Rexneyên ENKS`ê yên astengirina diyalogan ne rast in

Sekretêrê Gişтî yê Partiya Çepgir ya Demokratîk ya Kurd li Sûriyê û endamê Partiyên Yekîtiya Nîştimanî ya Kurd (PYNK) Salih Gedo diyar kir ku astengiyên ku ENKS derdixe, behane ne û birêvebirina diyalogan asteng dikin.

Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS) li bajarê Qamişlo Komxebata Nakokiyên Kurdî-Kurdî li dar xist. Siyasetmedar, rewşnbîr, hiqûqnasên Kurd û saziyên civaka sîvîl beşdarî komxebatê bûn û bal kişandin ser van nakokiyan, rewşa gelê Kurd û Kurdistanê nîqaş kirin û bi riya nîqaşên xwe nêrîneke kurdî ya nîştimanî pêşniyar kirin.

'HELWESTA ENKS`Ê DIYALOGÊN KURDÎ LEWAZ DIKE'

Sekretêrê Gişтî yê Partiya Çepgir ya Demokratîk ya Kurd li Sûriyê û endamê Partiyên Yekîtiya Nîştimanî ya Kurd (PYNK) Salih Gedo sedema derengmayîna qonaxa sisiyan ya diyalogan eşkere kir û got, divê ENKS sedema derengmayîna qonaxa sisiyan eşkere bike. Lewre helwest û bertekên wan diyalogan lewaz dikin û rê li pêşiya berdewamkirina diyalogan digirin.

Gedo di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Ez bawer dikim ku astengiyên ENKS derdixe, behane ne. Ji ber wê divê ENKS li xwe vegere, li ser maseyê diyalogan bicive, rê nede pirsgirêkên heyî ku danûstandinan lewaz bike û hewldana vekirina defterên gazinan neke, ji ber ku defterên gazinan wê nekevin xizmeta wê."

'DERXISTINA ASTENGIYAN ISBATA GIRÊDANA BI DIJMINÊN DOZA KURDÎRE YE'

Lêkolîner û siyasetmedarê Kurd Azad Elî diyar kir ku astengiyên ku di danûstandinên kurdî de derdikevin, encama hişmendiya hin aliyên kurdî yên siyasî ye yên ku naxwazin xwestekên Kurdan bi cih werin û nêzîkî dijminên doza kurdî ne û wiha got: "Ev alî naxwazin nakokiyên heyî bi diyalogan werin çareserkirin, heta xwe erkdar nabînin ku bigihîjin çareseriyeke siyasî jî."

Azad Elî axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Divê diyalogên kurdî dewam bikin û hîn zêdetir berfireh bibin da ku civaka sîvîl ya kurdî jî hembêz bike û beşdarî çareserkirina pirsgirêkên di navbera partiyên siyasî de bibin, herwiha di wê baweriyê de bin ku ev danûstandin riya yekane ya çareserkirina doza kurdî ye.

ANHA

Kongreya Damezrîner ya Meclisên Herêmên Dêrezorê hat lidarxistin

Bi armanca bi rêxistinkirina xebatê meclisên herêma Dêrazorê da ku karibe hê baştir xizmetê pêşkêş bike, Kongreya Damezrîner a Yekemîn a Meclisên Herêmên Dêrazorê hate lidarxistin.

Kongreya Damezrîner ya Meclisên Herêmên Dêrezorê li hola civînan ya Meclisa Sîvîl ya Dêrezorê ya li herêma Meamil li dar ket. Endamên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, şandeyek ji Koalisyona Navneteweyî, fermandarên Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê, QSD, endamên saziyên sîvîl û meclisên hatîn avakirin, herwiha şêx û rûspiyên herêmê di kongreyê de amade bûn.

Piştî rêzgirtinê bi navê Rêvebiriya Xweser Bêrîvan Xalid lidarxistina kongreyê ji bo şêniyên Dêrezorê yên salên dawî êş kişandî, bi rojeke dîrokî bi nav kir û wiha got: "Bi fedekariya QSD'ê ku bi hezaran şehîd dane, herêm ji çeteyên DAIŞ'ê hat rizgarkirin, meclisên herêmî û Meclisa Sîvîl ya Dêrezorê hatin avakirin."

Bi navê Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê Ehmed El-Xebîl jî diyar kir ku avakirina meclisên Dêrezorê di dîroka Rêveberiya Xweser de gaveke girîng e û wê hêzên leşkerî yên herêmê ji bo xizmeta welatiyan û parastina saziyan bi hev re bixebitin.

El-Xebîl diyar kir ku avakirina 4 meclisan li Dêrezorê tê wateya piştgiriya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê.

Bi navê Meclisa Qanûnsaz Ziyab El-Cîlat jî got, serkeftinên li Dêrezorê berhemên keda şehîdan in. Ji ber wê divê em di Rêveberiya Xweser de li hemberî planên dijber bisekinin. Bi navê Meclisa Rêveber ya Dêrezorê Xesan El-Yûsif jî got, guhertina li Dêrezorê çêdibe, destpêka jinûvesazkirina sazûmaniya Rêveberiya Sîvîl ya Dêrazorê ye û wiha domand: "Rêveberiya Sîvîl û rûspiyên eşîrên herêmê, ji 8 mehan ve ji bo vê roja dîrokî kar dikin, ku 4 meclisan li Dêrezorê ava kirin."

Di dawiyê de endamên meclisên Dêrezorê sond xwarin ku projeya neteweya demokratîk û Rêveberiya Xweser biparêzin.*ANHA*

Çawa Li Hundir Wisa Jî Li Derve

Idrîs HENAN

Dema ku mirov li dijî xwezaya xwe biherike, dê bi heqîqeta gerdûnî re rûbirû bimîne. Ji xwe sempatiyên kesayetan li gorî rastiya daxwaza hîsên hundirîn ava dibin. Bi gotineke din; di realîteya mirovan de, hizirîna veşartî ya rastleqîn a gelek cil û berg li xwe kiriye heye. Ango; tu di hundirê xwe de çawa bî, tuyê li derve jî rastî wê werî. Ji lew re, gelek tiştên jiyanî ku pirî caran serê mirovan diêşînin di cewherê xwe de yekbûna fikirînên hundirîn û realîteya ku biçim girtiye ye. Ji ber vê jî ne sosret û ne jî ecêbe ku kesê nikaribe çareyan peyda bike, realîteya wî rev be. Kesê ku hişmendiya wî dagirkerî, talanî û serdestî be, realîteya wî jî sempatiya van kiryaran be ku ji destê derê ti qisûrê nakê.

Vê dawiyê, bi serperştiya şîrketên îstixbarata tirk, hinek rojnameyên navneteweyî derbasî herêma Efrînê ya dagirkirî bûn. rojnameya bi nav û deng New York Times a ku xwedê giravî rojevên dunyayê diyar dike, piştî serdana Efrînê, di pêşgotina xwe de dagirkeriya tirk weke benda li ber komkujiyên rejîma Esaad da pênasekirin!. Rojnameya qaşo bi nav û deng ji bîr kir ku rojekê nav li realîteya Efrînê ya piştî êrişên dagirkeriyê yên 20 Çileya 2018'an kiribû "dagirkerî"?! Rojnameyê bi van kiryarên xwe ku eşkere şirîkatiya dagirkeriya tirk dike, hemû pîvanên rojnamegeriya azad bin pê kirin û derveyî rêbazên meslekî rapora xwe amade kir. Ango çi nûçegihan e ku di nava serdaneke çend saetan de dikaribû hemû jiyana li Efrînê bişopîne? Ma çey rojname nizane ku Efrîn herêmeke kurdî ye ku rêjeya wan tê de ji sedî 95 derbas dikir?

Bê guman dizane û begraunda cografî, siyasî, civakî û etnîkî ya Efrînê ji her kesî baştir dizane. Lê navenda ku li gorî zagona gerdûnî ya "çawa li hundir wisa li derve jî" tevdigere, çiqas xwe bi xemil û xêz bike jî, her realîteya wê sempatiya ji neyar û dagirkeran re ye. Ji bûna wê jî rojnameyek wisa xwe bi nav û deng dihesibîne dikare derveyê nirxên exlaqî yên mirovahiyê bi hêsanî rastiyan berûvajî bike. Tevî ku gelek sazî û rêxistînên navdewletî "rêxistina efûya navneteweyî, humen rights watch" ku êdî nekarîn rastiya qirkirina li Efrînê li ser desîtên dagirkeriya tirk û çeteyên wê rû dide veşêrin û di vê derbarê de gelek raport derxistin, lê rojnameya xwe weke dengê heqîqetê dide diyarkirin, ev tişt hemû vala derxist û hewl da rûyê dagirkeriyê xweşik bike! Li ser zarê mubatên çeteyan ku ne şêniyên Efrînê ne, bineya naveroka raporta xwe amade kiriye û dagirkirina Efrînê weke gavek rewa û heqekî meşrû ya tirkiyê bi nav kiriye!

Vê jî naxwazim bibêjim; lê ya ku pêwîste bête lêkolînkirin û li ser bê sekinandin ew e; gelo em weke rojnamevan, çiqas me cewherê dagirkeriyê bi raya gişтî re parve kiriye? Me çiqas civaka navneteweyî daye iqna kirin ku tişta li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagirkerî ye ku li hemberî derewên New York Times derkevin? Eger hêza me ya parastinê ewqas rê vekiriye ku sempatiya hemû dunyayê wergirtiye, ecebe çima saziyên me yên ragihandinê nekarîne vê yekê di pratîka rojnamegeriya Rojava, Bakur û Rojhilatî Sûriyê de biteyisînin? Ka reaksyona saziyên pêwendîdar ên li hemberî vê derewa mezin a rojnamegeriya ku xwe şoşbanê rastiyê dibîne? Ecebe tu sendikayekê ne dikarî daxuyaniyekê jî bida ku tişta di vê raporê de hemû derew in û tenê ji ber berjewendiyên global hatiye nivîsandin? Ecebe… ecebe… hwd.

Bê guman tişta di wê raporê de hatiye gotin ti carî ne gengaz e ku weke "azadiya ramanê" yan jî rojnamegeriyeke azad bête qebûlkirin. Di bin van siloganên derexlaqî de azadî nayê bidesxistin û ne jî têye pîvan. Ên ku heya niha di xeyalên liberalîzmê de xwe fetisandine, encax ew tenê wê raporê qebûl bikin ku hundirê wan jî heman hizirîna amadekerên wê raporê ye?.

Karayilan: Lehengên Garê Erdogan neçarî gotina "Em bin ketin" kirin

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Mûrat Karayilan diyar kir ku cara yekê ye Erdogan neçar dimîne bêje 'Mixabin em bi ser neketin' û got, lehengên me yên li Garê ev axaftin bi Erdogan dan kirin."

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Mûrat Karayilan ji Stêrk TV re axivî û bi berfirehî qala êrişa dagîrkeriyê ya li ser Garê û berxwedana gerîla kir.

Karayilan diyar kir ku şer û berxwedana Garê di dîroka Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê de ji niha ve cihekî girîng girtiye û got, bi ked, wêrekî û fedakariya şehîdan ev destan hat nivîsîn. Karayilan da zanîn ku êrişa ser Garê ne operasyoneke asayî bû; di asta herî bilind de hat birêxistinkirin, biryar li ser hat dayin û got, serokkomar, wezîr û fermandarên wan yên gişтî bixwe li ser sekinîbûn.

Herwiha bi mehan amadekariya wê kirin û piştre êriş kirin.

Kurdayetî

Dijwar Ehmed Axa

Ji ber ku zana, xwendevan, rewşenbîr û ronakbîrên Kurd di milê heskirina welat de xwediyên mîraseke mezin û giranbiha bûn, (di heman demê de ji bo Kurdistanê pir şoreş û serhildan çêbûbûn) fikra netewperwerî û evîna welat her dem û her gav di hiş û mejiyê wan de cihê xwe çêkiribû. Ango fikra kurdîtiyê mohra xwe li kar û xebata wan xistibû.

Komela Pêşketina Kurdistanê; ji destpêka avakirina xwe ve (sala 1918) li ser vî bingehî karê xwe dimeşand û kesên Komele damezirandîn ev bûn: Xelîl Xeyalî, Hemzeyê Miksî, Bedîûzeman Seîdê Norsî. Komeleyê bandora xwe li kovara "Jîn" jî kiribû. Lewra nivîsar û helbestên di kovarê de derketîn bi awayekî eşkere û berbiçav di didin diyarkirin.

Armanc azadiya gelê Kurd û rizgarkirina Kurdistanê bû. Ji bo gihîştina vê armancê, di tevayiya jimarên kovara "Jînd" de doza kurdî hatiye raghandin û di wê rê de xebat hatiye kirin .

Emê niha ji we re li ser vê mijar cend mînakan bidin diyarkirin.

Name, nivîsar, helbestên di jimarên kovarê de hatîn weşandin ev in:

Yek

DR Fuad Berxo, şehîdê Kurd û Kurdistanê (1887-1925) di nameya xwe ya di dîroka 29/11/1918`an de wiha nivîsiye:

"Pêşedem çiqas tarî û bibager dibe bila bibe, ew ciwanên ku îro ji bo kurdîtiyê diqîrin, ez li pêşberî wan bi xuşûeka kûr û xwedayî, bi bawereyeka ezelî serê xwe ditewînim"

Jîn jimar 5 , rûpel 11

Dido

Evdirehîm Rehmî. (1980- 1958) fikra welatevînî û nîştimanperwerî li cem nivîskar û hozan Evdirehîm Rehmî yê Hekarî bûye evîneke dijwar. Wê evînê, di nivîsara wî ya bi dîroka 26.1.1919 `an de, ku bi serenivîsa "Welat" hatiye weşandin, wiha rû daye:

"Îroke di qelbê me hemûyan de evînek heye, agirek heye ku em daîma bi wê eşqê, bi wê evînê disjoin, diqelin û ji ber wî agirî ne xwedanmal in, ne xwedankur in, ne xwedanheyat in. Welhasil bi her tiştê xwe em hazir in di wê rê da bidin. Ew çi eşq e, çi evîn e? Helbet ew evîniya welat e".

Jîn jimar 8 rûpel8

Sisê

Yûsif Ziya: (1882–1925) Ramanên wî yên kurdayetiyê di nava welatparêzan de deng veda û ciyekî pir bilind girt û bûye dozeke mûqedes. Ev jî, di vê helbesta ku şehîdê Kurd û Kurdistanê Yûsiv Ziya yê Bedlîsî ji kovara "Jîn" re wek nameyekê şandiye, eşkere tê xuyakirin:

"EL,an ku disekine li qeza Kilîsî Meşxûl e bi tehsîla pare filûsî

Ya Reb tu ji cemaeta Kurdan binivîsî

Mexmûm û feqîr Yûsif Betlîsî"

Jîn jimar 22 rûpel qap a diduyan

Çar

Memdûh Selîm: (1898–1976) Ji ber ku armanca Komela Pêşketina Kurdistanê û armanca kovara Jîn doza kurdîtiyê bû, di nivîsarên civakî da jî girîngî ji wê doze re hatiye dayîn. Em dikarin nivîsara Memdûh Selîm a bi sernivîsara "Xanima Kurd" wek nemûne nîşan bidin. Nivîskar di cîyekî ji wê nivîsara xwe da wiha gotiye:

"Pîreka (Jin) Kurd ji xwe azad e, sermiyanê mala xwe ye, ji bil daxwaziyên dînê islamê ji qeydên nuxaftinê azad e, ketiye nava jîna civakî ya ku mêr jî tê da ne û di wê jînê da ciyekî rêzdariyê girtiye."

Jîn jimar 22 rûpel 8.

"EGER BI SER BIKETANA WÊ HILBIJARTINA PÊŞWEXT BIKIRAN"

Karayilan axaftina xwe wiha domand: "Eger di êrişên xwe de bi ser ketibûna wê hilbijartina pêşwext pêk bianiyan. Bi vê armancê tevgeriyan. Di nava sal û nîvê de li bakurê Kurdistanê ji Serhedê heta Mêrdîn û Dersimê li dijî hêzên me deh operasyon pêk anîn. Ev hemû bêencam man.

"WÊ BI ÊSÎRAN PROPAGANDA BIKIRAN"

Li heman herêmê êsîr hebûn. Di vî warî de agahiya wan hebû. Me jî dizaniya haya wan ji vê heye. Dixwestin sax yan jî mirî bixin destê xwe û propagandayê bikin. Pêdiviya wan bi vê hebû ji bo desthilatiya xwe bidomînin. Erdogan bi qumarê lîst û xisirî. Ji bo dagîrkirinê hat û nikarî dagîr bike. Êsîran jî li şûna rizgar bike kuştin; gelek zêde xisirî.

"ERDOGAN CARA YEKÊ NEÇAR MA BÊJE 'EM BI SER NEKETIN"

Karayilan da zanîn ku Erdogan cara yekê ye neçar ma ku bêje 'Mixabin em bi ser neketin' û wiha dewam kir: "Lehengên me yên li Garê ev axaftin bi Erdogan dan kirin. Em çiqas qala berxwedana li Garê bikin têrê nake.

"HEYETÊN SERBIXWE DIKARIN BÊN"

Karayilan da xuyakirin ku ji sedî sed operasyon ne ji bo rizgarkirina êsîran bû û got, dijmin xwest li navenda Garê bi cih bibe. Lê belê dîtin ku dor li wan hatiye girin. Neçar man vekişin. Bila malbatên êsîran, gelê Kurd û gelên Tirkiyê baş bizanin ku ji bo rizgarkirina êsîran hewl nedan. Em vekirî ne, heyetên serbixwe/navneteweyî dikarin bên qada me. Cenazeyên hevalên me yên şehîd bûyîn, dikarin ji wan mînakan bigirin. Dikarin li kampê lêkolînê bikin. Em wan vedixwînin; bila bên lêkolîn bikin. Bila bên bibînin ka faşizma tirkî çi kiriye."

Ji bo şehîdê berxwedana Garê Seydo Refîq merasimek hat lidarxistin

Meclisa Malbatên Şehîdan ya kantona Efrînê ji bo şehîdê berxwedana Garê Seydo Refîq (Hogir Neasan) merasimek li dar xist.

Meclisa Malbatên Şehîdan ya Kantona Efrînê bi merasimekê nasnameya gerîlayê HPG'ê Seydo Refîq (Hogir Neasan) ku di berxwedana Garê de şehîd bûye eşkere kir. Merasim li qada kampa Serdemê ya navçeya Ehdasê ya kantona Şehba bi amadebûna bi hezaran şêniyên herêma Efrînê hat lidarxistin.

Piştî rêzgirtinê endamê rêveber yê Meclisa Malbatên Şehîdan Fewzî Mistefa sersaxî ji malbata şehîd Seydo û tevahî şêniyên Efrînê re xwest û behsa berxwedana dîrokî a ku gerîlayên HPG'ê li Garê raber kirine ku planên dagirkeriya Tirk têk birin, kir.

Hevseroka Meclisa Rêveber ya Herêma Efrînê Şîraz Hemo li ser têkçûna dewleta tirkî di berxwedana Heftanînê û Eyn Îsayê de axivî û diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker bi hevkariya PDK'ê xwest Garê dagîr bike, lê bi saya berxwedana gerîlayan planên wan têk çûn.

Endamê Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ya kantona Efrînê Mihemed Mistefa nasnameya şehîd Seydo xwend û radestî malbata wî kir.

ANHA

Piştgirên Kurdan hevgirtina wan û çiyayên wan in

Hediya HISÊN/Qamişlo

Rewşenbîrên bakur û rojhelatê Sûrî serkeftina gerîla ya li Garê pîroz kirin û serbilindiya xwe bi berxwedana keç û xortên xwe anîn ziman.

Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê Enahîta Sîno li ser mijarê wiha axivî: "Çiyayê Garê di navbera başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê de ye û cihekî stratejîk e. Ji ber wê dewlat tirkî ya dagîrker xwest dagîr bike. Çimkî eger Garê bikeve wê derfetên dagîrkirina başûr, rojava û çiyayê Şingalê li pêşiya dewleta tirkî fireh bibe. Bêguman dagîrkirina Garê ne plana dewleta tirkî tenê bû, Israîl û Emerîka jî di nava planê de bûn. Berxwedana keç û xortên me cihê rêzgirtinê ye. Dewleta tirkî xwe xapand, ziyaneke mezin gihatiyê û mînakeke piçûk bû ku nikare Kurdan bişkîne."

Enahîta Sîno got, çiqas helbest, nivîs û gotar bên nivîsîn mafê berxwedana li Garê û Heftenînê nadinê. Erkek ji erkên me ye em bi nivîsan wê berxwedanê bidin pêş û bi pênûsên xwe lê xwedî derkevin.

Endamê Yekîtiya Rewşenbîran Helbestvan Ebûd Mixso jî wiha axivî: "Serkeftina Garê ji bo hebûna Kurdan û tinebûa dijmin bû bendek. Garê mînakeke ji serkeftina Heftenîn û Kobanê ye.

Çima Garê ?

Çawa ku Kerkûk dilê Kurdistanê ye, Garê jî dilê çiyayên Kurdistanê ye. Çimkî di navbera çar perçeyên Kurdistanê de ye. Rewşenbîrên bakur û rojelatê Sûrî bi pênûsên xwe piştgiriya berxwedana li Garê kirin. Bi nivîs û helbestên xwe em berxwedana Kurdan didin pêş. Bi vê berxwedanê cîhan matmayî ma. Dewleteke hêza duduyan ya NATO bi çekên herî pêşketî, li himberî hêzeke ku ti kes piştgirya wê nake û bi çekên piçûk şkest."

Mixso di dewama axaftina xwe de wiha got: "Serkeftina Garê moralê Kurdan bilind kir. Yekîtiya Kurdî jî bi vê berxwedanê bihêz bû û civînên xwe domandin. Çimkî ev demek e hevdîtin rawestiyabûn. Di navbera her du aliyên Kurdî de xemsarî û bêbawerî çêbûbû. Lê bi vê berxwedanê ev xemsarî rabû."

Mixso bang li Kurdên Başûr kir ku neyên lîstik û planên dewleta tirkî û ji tecrûbeyên kevin dersê bigirin. Ji bilî çiyayên Kurdan hevalên wan nînin û em piştgirên hev in."